

HAWAR

Sala 1 - Hejmara 1 - 15 Gulan 1932



Mîr Celadet Alî Bedîrxan

Koma Nûs

HAWAR

Ji xwendevanan re, Hawar hawara we ye, Deng û gaziya we ye, Jîn û zanîna we ye, Werin hawara xwe bin, Hawar Komela Kurdî

Têdexistiyên Komelê:

- **Aramanc û awayê xebat û nivîsandina Hawarê.**
- **Ji xwendevanan re Alfabêya Kurdî.**
- **Stûna feqehan.**
- **Stûna zarowan: buhar.**
- **Edebiyeta welatî.**
- **Hawar hebe, gazî li dû ye.**
- **Di dora dinyayê de.**
- **Xatir xwazî ya Memî.**
- **Hêvî ji xwendevanan.**
- **Ferhengok.**

Armanç û Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê.

Hawar dengê zanîne ye. Zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ku xwe nas dike; dikare xwe bide naskirin.

Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin. Lewma ku ziman şerta heyîne a pêşîn e. Hawar jû pêve bi her tiştê ku Kurdanî û

Kurdîti pê bendewar e, dê mijûl bibe tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatên welatî re hiştiye, bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, huner, û sinehetê de dê bixebitin.

Awayê xebatê: karekî ku bikare biçe serî, divêt jê re pironivîsek bêt çêkirin, me pironivîsa xwe li ser bingehên jêrîn lêkirî ye.

1- Belavkirina Alfabêya Kurdî di nav Kurdan û hûnkirina wê. Senifandina zimanê Kurdî û hin bi hin di komelê de belavkirin û pêşdetir di şiklê kitêbê de derêxistin.

2- Sehîtiya zarên Kurdî û berhevdanîna wan. Sehîti ser mirovatiya zimanê Kurdî digel zimanên din ên arî. Sehîti ser bingehên zimanê Kurdî, ser dîrok û awayê rabûna û pêşveketina wî.

3- Ber hevkirina çîrok, çîrçîrok û her texlît laje û stranên Kurdî û birêve belavkirina wan.

4- Senifandin û belavkirina dîwanên Kurdî. Bi van ve jînenîgariyên şair û mirovên bijarte jî dê bîna belav kirin.

5- Sehîti ser reqs û qeydeyên stranên Kurdî.

6- Sehîti ser her texlît rêzikên Kurdî û Kurdistanê, yên zemanê borî û yên îro û senifandina wan, û sehîti ser pîş û sinhetên Kurdî.

7- Dîrok û erdnîgarî: Sehîti ser tevayîya dîrok û erdnîgariya Kurdistanê û ser dîroka eşîran, berî , paşî û di wextê Mîr -Şeref de.

Awayê nivîsandinê: Di heqê zimanê me de heta niho gelek tişt hatine gotin di nav van gotinan de tiştne rast û nerast jî hene . ez ku Kurd û Kurdmanc ziman im û zimanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt zimanên din daniye ber hev, kîtkîten wî hûrhûnadine; qeydeyên wî ji hev derxistine, dikarim ji biyaniyan bêhtir û qencir dehkera wî bidim xuyakirin û zanîn.

Zimanê me îro hem freh hem teng e. *Frehe* : bi her tiştê ku Kurd pê mijûl bûne, dest dane ser wan, di wî warî de zimanê Kurdî hin zimanên din û ji hinan bêhtir pêşve çûye, kemiliye, û ji tu zimanan kemilî bi şûn denemaye. *Tenge* : Herçî ku ji Kurdan re nenas mane û Kurd pê mijûlnebûne, di wî warî de zimanê me rawestiyaye, pêş veneçûye, di cihê xwe de maye.

Lê zimanê ji wan zimanan e ku ber her tiştê nuh, pirsên nuh dizên û bi rêve pirsên nuh ji wan çar dibin. Herwekî xelkê Geliyê Goyan, berî çardeh salan, gava tiyare dîtin, tavil bi zarê xwe balafir nav lê kirin; ji lewre ku ji banî, ji bala difire, dîsa Kurdmancine ku telêfon dîtin ji mesmeha wê re bihistok gotin. Jiber ku deng pê têt bihistin.

Niho em vegeirin ser gotina xwe; ser awayê nivîsandina zimanê xwe. Îro di zimanê me de du texlît kêmanî hene: Windabûna pirsine Kurdî û ketina pirsine biyanî nav zimên. Em çî bikin ku zimanê me bikare vegere ser xurtiya xwe û di nav zar û zarawayên xwe de bikemile û bibe zimanekî tekûz

Di windabûna pirsan de, pirsin hene yekcar winda bûne, hin hene ji zerekî ketine lê di zerekî din de dijîn û çendek hene di axaftinê de kêmanî tene gotin lê di mamik, medhelok, çîrok û stranên de tene

bihîstin, em li pey wan in, hin bi hin em wan diêxin dest û disenîfînînin û gora mehçetê jî ji nuh ve ser awayê hevdûdanîna pirsên Kurdî pirsine nuh çêdikin, ji bona pêşveçûna zimên, divêt em bendên xwe bi tevayîya van pirsan binivîsînînin û li paşîya her hijmarê ferhengokekê danîn û tê de mana pirsên ku di zaran de kêmbûne û yên ku ji nuh ve hatine hevdûdanîn ji xwendevanên xwe re bidin zanîn.

Ji xwendevanê xwe hêvî dikim ferhengoka me qenc bixwînin û di heqê pirsê de ku fikreke wan hebe ji me re binivîsînînin; heke ciyoka pirsê bizanin, ewa ha jî tev mana û ferqên wê digel ciyoka xwe ji me re bidin zanîn.

Weko: rêkirin, şandin, hinartin, ciyokên hev in, lê di mana rêkirinê de ji mana şandin û hinartinê ferqek heye. Rêkirin, herhal, bi rê existin û

şandin e. Dîsan, xebirdan, axaftin, peyîvîn ciyokên hev in gelo di neqeba wan de çi ferq hene?

Hawar zarokeke nûza ye. Zarowa me ye; zarowa Kurdan e. wek her zaro bi xweyîtiya dê û bav, bira û pismamên xwe dikare bijî. Her kes her Kurd dikare arîkariya Hawarê bike. Tu kes mebeje ku ez mirovekî reben û nekêrhatî me. Ji min diayê pêve tiştêk nayê. Belê, tukes vê xeberê mebeje, herkes bi tiştêkî, bi awakî dikare bê hawara Hawarê. Tinê di be ku awayê Hawarê nizane, jêre çend awa hene:

1- Kiriyarê Hawarê bûyîn û jê re kiriyanan peyda kirin.

2- Navên mirovên xwendewar lê ne maldar, ku nikarin kiriyan bibin, û navên medresan ji me re dan zanîn. Da ku Hawar herwe bête şandin.

3- Paş xwendina Hawarê ji heval û nasên xwe re danxwendin û ji mirovên nexwenda re bi xwe xwendin û ew ser têdexistiyên komelê serwext kirin

4- Ji Hawarê re her texlît şîr û bendan nivîsandin.

5- Çîrok, medhlok û mamikan berhevkirin û ji Hawarê re şandin.

6- Di heqê welat, eşîr, bajar û gundên xwe de tiştine kevin û nuh ji Hawarê re rêkirin.

7- Her texlît bergehên Kurdistanê peyda kirin û digel wêfên wan ji me re hinartin.

Ji gotinên jorîn qenc dixuye ku ji Hawarê re arîkariya gelek hêsanî ye. Kesê ku dil bike dê bikare jî.

Di destpêkê de komela me di panzdeh rojan de carekê dê derkeve. Piştî çend hejmaran komela me dê bibe heftêkî û li serê her heftiyê dê belav bibe.

Alfabêya Kurdî

Bi navê yêzdanê pak ê dilovan û mihrîvan.

Alfabêya Kurdî ji sîh û yek herfan hevdudanî ye:

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z.

Herf di dengdayiyê de du texlît in:

Dengdêr û dengdar.

Dengdêr ew herf e ku dixwedeng e, û dengê wê bi serê xwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne.

Dengdar ew herf e ku dixwedeng e, ê lê belê dengê wê bi serê xwe û bê arîkariya dengdêrê dernakeve.

Di zimanê Kurdî de 8 dengdêr hene :

a- e- ê- î- î- o- u- û

Lewre ku di denganiya Kurdî de dengdêrekê geh kin û geh drêj

nabe dengdêrên Kurdî di drêjahiya dengên xwe de sersekinî ne : kin û drêj in.

Dengdêrên kin:

e : der, şer, ser

i : kin, din, bin

u : Kurd, kur, kul

Dengdêrên drêj:

a : av, sar, bar

ê : dêr, şêr, mêr

î : tîr, zîv, şîv

o : dor, sor, kor

û : kûr, şûr, dûr

Di zimanê Kurdî de bîst û sê dengdar hene:

b : bar, bav, ban

c : car, can, cûn

ç : çar, çûn, çem

d : dar, dan, dîn

f : fanos, filan, find

g : gav, giş, garan

h : hîm, hêja, halan

j : jin, jor, jaî

k : ka, ker, kom

l : lo, law, lez

m : mar, mêj, mak	n : nan, nerm, nas
p : par, por, pehin	q : qîr, qenc, qelî
r : rê, rû, reş	s : sar, sebat, sofi
ş : şor, şev, şa	t : têr, taket, tûj
v : vajî, vala, virnî	w : war, werîs, wek
x : xanî, xwarin, xêr	y : yar, yek, yarî
z : zor, zabit, naviz	

Ji van pêve du herfên biyanî hene ku birek ji Kurdan wan dibêjin. Lewre ku ew herfên ha di eslên xw de ne Kurdî ne me ewneexistine nav alfabêya xwe.

Ew jî (ح) (غ) ne, me ew du herf bi danîna du deqan ser (h- û x-), H wek hal, û X xar.

Ku ev du deq ketin ev herfên ha vedgerin ser herfên Kurdî û dibin h, x. Ji xwe piraniya Kurdan şûna (ح) (غ) dibêjin; xeyîdîn

Hawar dengê zanîne ye. Zanîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ku xwe nas dike dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide naskirin. Lewma ku ziman şerta beyîne a pêşîn e. Hawar jû pêve bi her tiştê ku Kurdanî û Kurdîtî pê bendewar e dê mijûl bibe.

Bi xêzên jorîn ve me rêberî û rêzaniya Alfabêya Kurdî kuta kir. Ji niho pêde bi hûrhûnandina hevdu danîna wî dê mijûl bibin, dûmahîk heye .

Sitûna Feqehan

Pêrar, digel çend hevalan derketî bûm gerê. Çendekî di nav fekehan de mam. Me sê çar medrese dîtîn di hin medresan derketî ji xelkê cih bêtir bûn. Di nav wan de xortên her welatî, her eşîrî peyda dibûn Serhedî, Heza Romî, Botî, Diyarbekrî, Bedlîsî, Mûşî.h.p. Bi dîtina min gelek kêfxweş dibûm, ji min ser Kurdanî gelek tiştan dipirsin.

Piraniya wan bi herfên latînî jî dizanîbûn. Pêkeve digotin ku Kurdmançî bi herfên latînî gelek qenc têt nivîsandin, ji bin paşlên xwe pelin derxistin û ji min re dixwendin. Te digot, hemî jî şair bûn. Şîhrên wan tev ser welêt û millet bûn.

Weko: Bêriya Botan, zozana şerefîdînê, Girên beriyên, Çiyayên Dêrsimê, Bidlîsa kevna.....

Girêdana wan jî Kurdmançî bû, ji xelkê cih re jî cilên Kurdmançî dabûn xwe ragirtin. Kolosên xwe bi xwe çêdikirin. Di nav axaftinê de min ji wan re da zanîn ku dilê min heye rojnameke Kurdî derêxînim. Ji min daxaz kirin ku ji wan re di rojnamê de stûnekê vekim. Di vê stûnê de herçî ku di medresan de nayên xwendin ji wan re bidim zanîn.

Em welê lekatî bûn, ku ew ji min bipirsin ez jî gora pirsyariya wan behsên ser îlim û huner ji wan re bêjim, Feqehîno! Ev e stûna we. Hun hema bipirsin.

Herçî ez bi xwe dizanim ji we re bêjim, heke di nav pirsyariyên we de tiştek hebe ku ez pê nizanim, ji wan dipirsim ku pê dizanin û ji we re bidim zanîn.

Stûna Zarowan:Buhar

Buhar e, nuh buhar e,
Tebîet giş li kar e,
Çi heyadan çi hal e.
Her tişt zendî rewal e,
Buhar e, nuh buhar e,
Tebîet giş li kar e.

Berf dihile li zozan,
Stirî şîn in li deştan.
Kulîlk hêj nuh şepal in,
Gul û bilbil heval in.
Buhar e, nuh buhar e,
Tebîet giş li kar e.

Mij ketiye li daran,
Hure-hur e tum baran.
Mih û berx in dikalin.
Buhar e, nuh buhar e,

Tebîet giş li kar e.

Roj vedide mîna bûk,
Şûn ve mane ba û pûk.
Şiher, zinar, lat û ber
Diçirisin der bi der.
Buhar e, nuh buhar e,
Tebîet giş li kar e.

Edebiyeta Welatî

Edebiyeta welatî, ew edebiyet e, ku ji jîna miletî, ji hiş û dilê wî, ji dîrok û çîrçîrokên wî, ji stran û lajyên wî hiltêt. Kaniya wî, dilê milet, hiş û heyata wî ye. Tinê ev edebiyet e, ku germ rengîn, bibin û xwedan ronahî ye. Ji vê edebiyetê, dengê bilûr û dîlanê. Stranên çiyê, zîziya hêvîn, û hejkirinê bi teptepa dilan ve tîn bihîstin. Piraniya miletan pirîcaran vê rastiyê seh nedikirin, ber nediketin.

Li Ewropayê, miletin hebûn ku hej zimanên xwe nedikirin, zimanên xwe biçûk teng, nespehî û nehêja didîtin. Ev hal di welatên rohilatî de jî dihat dîtîn. Herwekî di nav Kurdan de, herçî mirovên zana radibûn xwe ne bi zimanê Kurdî lê bi zimanê biyaniyan dinivîsandin. Piştî xebata sedan salan; di welatên ewropa û rohilatê de hate seh kirin ku ev rê dernakeve û ev awa naçe serî. Çiku milet ji wan kitêban re guh nedida û xebata wan mirovan berxurdar nedibûn. Ber vê yekê ev mirovên ha vegeyriyan ser zimanê xwe. Vêca xebata wan zûka berên xwe dan û milet pey edebiyeta wan çû.

Bi vî awayî di nav miletan de edebiyeteke geç û zendî çar bû. Êdî her kes zana nezana, bajarî gundî ku xwendinê zanibe, zimanê wan seh dikirin, û kitêbên wan dixwendin. Ji xwe welê jî diviyabû. Jiber ku ji nivîsandin û belavkirina kitêban qesd ew e ku hiş û fikrên qenc bikevin nav xelkê, di dil û serên wan de cih bigrin. Ji mesela zimanî pêve meseleke din jî heye. Herwekî nas e fikr û hiş di dora zimanî de xwe dighînin hev, û her ziman fikr û hişên xwe û awayê gotina xwe bi xwe re hildigre û ew pê re diguhzin, û pey zimanên xwe dikevin. Bi vî awayî digel zimanî fikr û hişên biyaniyan jî tîn dikevin nav me de, di dil û hişê me de cih digrin, û rû û gonê me ên manewî dighurînin, diheşifînin.

Paşî vê gotinê, qesda me awayê edebiyeta me ji xwe têt seh kirin, û ew rêya ku em tere dixwazin herin bi xwe vedibe û dikeve pêşiya me.

Vêca divêt ku em bi zimanê dê û bavên xwe, bi zimanê şîrîn û delal, bi zimanê Kurdî bi Kurdiya xwerû binivîsin, û fikr û hisên xwe ji çîrok û stranên Kurdî bigrin. Ji xwe Ahmedê Xanî berî sêsid salî va rêya ji me re vekiribû. Lê heyf paşiyê wî pêve neçûn. Xanî kitêba xwe bi Kurdmancî nivîsandibû û fikr û hisên wê ji çîrçîrokek Kurdî, ji Memê alan girtibû. Xanî xurtiya zimanê xwe hêj wê gavê hisiyabû, û ji wan re ku pê nedivîsandin bi beyta jêrîn dixwast bide zanî:

((Safî şemirand vexwar Kurdî Mavendî- derî lîsanî Kurdî))

Êdî çax e, ku em bidin pey Xanî.

Dr. Kamiran Alî Bedîrxan

Hawar hebe, Gazî li dû ye

Ji bona brayê min *Osman Sebrî*:

Şeveke tarî, çav çavan nabîne. Qeşa erdê wek gîzanan lingên min ên xwas dibire. Bayê reş carnan dikeve guhekî min û di ê din re derdikeve. Qet nizanîm ku li kû me? Heyanî xwe bi lîxistina gopal li erdê dizanim. Ev çend roj û şev e bi vî awayî diçim, dawî nayê, ji welatê berf û bagerê xelas nabim.....

Belê îşev jî wek her şev tarî ye. Berf û bager ji awakî li min dide; sar e dicemidim tewş e, livîn di min nema, deng ji min dernayê. Tinê sê dengên min kire gazî û hawar!...

Gelo, ev xewn e? çavên xwe vedikim bawer nakim. Lê dizanim ev deng, dengê kurê min e " Bavo! Bavo! "

- Ha kurê min ez li kû me?

- Bavo! Bavê min li mal e, çima çavê xwe venake?

Dîsa bi tirs ku min çavên xwe vekir min dît ez li mala xwe me. Kurê min (himgir) li ber serê min rûniştî û got:

- Bavo, gava ku Roman welatê me dişewitand tu hê li ku bûyî, ji ber vê yekê me xort û canan hevdu girt û dijminên xwe qels kir, me welatê xwe ava kir. Divêt ku bavê me jî bihata; lê te xuya nekir, ji xwe min xewna te jî dîtibû ku tu di tengasiyê de yî; tu li me „ hawar! „ dikî.....

min şal û çapikê xwe tev şidand û ça û zinaran derbas kir, ez hatim. Min dît ku bavê min ji serma û pûkê qefiliye; dilê te tinê davêt; hema min bavê xwe girt, û pirtûkên xwe lê şidand û me rêya mal girt. Ev çend roj e em hatine; dê rabe îcar tu rabe me bi jîn ke!

Jiyîn çiqas delal e
Di nêv bav û biran de.
Dil heyê ku nenale
Ber birînên rîman de
Ev birînên rîman e;
Barekî pir giran e:
Kezeb, gurçik nemane;
Li pepûkên xwe ha de.
Hawara me vava ye,
Xewa bêkêr bela ye,
qet şik tê de nema ye,
Di gotinên yaran de.

Qedrican

Di dora dinyayê de

Bê şik heke xwendevanên me ji mijûlayiya me a binge hî pêve dê dil bikin ser her tiştên dinyayê serwest bibin. Me ev stûna ha ji bona wî vekir. Ji hejmara duwim ve emê dest pê bikin û xwendevanên xwe ser bûnebûwên dinyayê serwest bikin.

Xatir xwezî ya Memî

Mem got, dê kreremke ezbenî tu.
dêka min î tu, nebayî wek dû,
Qederê te, erê gelek giran e,
mem qedrê dêyan gelek dizan e,
Ser pêşîr û sîng û paşila te,
germî kê dida? tîne dilê te.
Dayê tu yî tu, tu dadika min,
dstê te hejand mehdîka min.
Alos î erê, erê tu dê yî;
fêkê te me, ez tu dar û ra yî
Dayê megrî xwedê piyar e,
lawê te ye Mem peşîb e,
Mak î erê tu, tu yî dilovan
lingên te de Mem peşîb e, qurban.
Iznê bide min ku dilbirînim,
dadê ji tere keça te bînim.

Dr. K.A Bedîr -xan

Dr. Kamîran Alî bedîr xan Memê Alan bi awakî nû nezîmandiye. Hin menzûmeyên wî di Hawarê de bêne belav kirin. Ev menzûma ha yek ji wan e.

Hêvî Ji Xwendevanan

Ji bona Alfabêya Kurdî Em ji te re vê alfabêya Kurdî rûpel bi rûpel di komelê de belav dikin, pêşdetir di şiklê kitêbê de bêt derêxistin.

Ji vê belavkirinê qesda me ev ku herçî xwenda û zanayên Kurdan hene. Rûpelên Alfabê yek bi yek xêz bi xêz, pirs bi pirs, bixwînin, qenc bala xwe bidin û her çî kêmaniyan bibînin ji me re binivîsînin, da ku em wan kêmaniyan rast bikin.

Jû pêve, ez ji wan tiştêkî din jî hêvî dikim. Ji me re ji bona her rûpelê pirsine nû peyda bikin û rêkin. Li rûpela pêşîn, me sê herf danîne (a d r) û bi van çend pirs çêkirin. Dibe ku bi van herfan pirsine din jî bêt çêkirin. Di rûpela duwemîn de herfên me bune pênc (a d r e m) me bi wan jî çend pirs dîtin. Heyê ku hinekî din jî peyda bibin.

Bi vî awayî xwendevanên me dikarin bi me re bixebitin û alfabêya me bi edilînin û qenctir bikin, ji pirsan pêve gora herfên her rûpelê cimleyên spehî û bihikmet, mamik û medhelokan jî bi kêrî me tên.

Lê divê ku xwendevanên me xwe bilezînin û heta heft-heşt rojan cuhabên xwe bigihînin me. da ku di hejmara duwîn de em bikarin wan belav bikin.

Ferhengok

Armanç:

Her tiştê ku ji bona avêtina nîşanê têt daçikandin. Paşiya tiştê ku çavê mirov lê ye û dixwaze xwe bigihîne wî: berike wî li armançê neket, armanca Hawarê pêşvexistina zimanê Kurdî ye.

Bendewar:

Pêgirêdayî: herçî Kurd hene hemî jî bi Kurdên Iraqê ve bendewar in.

Erdnigarî:

Ilma ku bi her awayî wesfa erd û dinyayê dide; çiya, çem, deşt, bajar, tendûrek, gol, newal, h. P. erdnigariya Kurdistanê.

Bingeh:

Hîm û eslê tiştêkî: herçend zimanê Kurdî û farisî di kîtîkên xwe de ji hev vedqetin lê di bengehê de digehin hev.

Ciyok:

Pirsên ku mana wan nizingê hev an wek hevin: rêkirin û şandin.

Dehker:

Rastiya tiştêkî ku tem carinan veşrî ye: ji gotina xelkê re guh mede dehkera meselê ez dizanim.

Dîrok:

Rastiya tiştêkî an mirovekî dîroka dinyayê gelek kevin e. Dîroka jîna Selahedîn bi sere xwe dinyayek e.

H. P.

Heta paşî

Jînenigarî

Awayê jiyane û tevayiya biserhatiyên mirovekî jînenigariya wî ye.

Pronivîs:

Her tiştê pêkhatî, nivîsandî nenivîsandî, ku awa û rêveçûna xebat û karekî nîşan dide, û berî destpêkirinê têt çêkirin, me pironivîsa xwe pêkanî, êdî divêt ku em dest bi xebata xwe bikin.

Ferhengok:

Ferheng komela tevayiya pirsên zimanekî ye. Ferhengok ferhengeke biçûk e ku tede pirsine wî zimanî peyda dibin. Fergngoka Kurdî ferhngoka Hawarê.

Zimanazîn :

Tevayiya qeydeyên zimanekî zimanazîna wî zimanî ye .

Her wekî me di serstûna xwe de got pirsin hene ku ji zarekî ketine lê di yekî din de dijîn.

Ji lewre dibe ku di nav bendên me de pirsine din jî hebin ku ji hin xwendevanên me re nenas in. Em ji wan hêvî dikin bila ji me mana wan bipirsin, da ku di ferhngoka hejmara duwîm de em bikarin mana wan jî bidin.

Kiriyariya Komelê

Kiriyarî:

Ji bona Sûrya, Tirkiya, Ecemistan, Iraq û welatên Qafqasê: Salekî 500 qirûş-sûrî, Şeşmehkî 300 qirûş-sûrî, Sêmhkî 175 qirûş-sûrî.

Ji bona welatên din:

Salekî 150 frenk

Şeşmehkî 90 frenk, Sêmhkî 50 frenk

Her tişt bi navê xweyî tene şandin Şam: taxa Kurdan

xwedî û midîrê berpisiyar . *Mîr Celadet Alî Beder –Xan.*

Têbînî:

Em wek Koma Nûs we sipas dikin û didin xuyakirin, ku me hin guhartin di nivîsandina *HAWAR* `ê de bikar anîn, ew guhartin jî, ji bo ku xwandina *HAWAR* `ê hêsantir be, wek mînak hevguhartinê tîpa "k" û "q" yên ku mîr Celadet ew berdêlî hev kirbûn di hejmara 1'ê de.

Ji bo tîkelî û pêşenyazên we bi Koma Nûs re :

e-mail: Komanus@gmail.com



"Şerma mezin ew e, ku mirov nezanê xwendin û nivîsandina
zimanê xwe be" **Celadet Ali Bedexan.**

Zimanê me nasnameya me ye
Koma Nûs
e-mail: komanus@gmail.com